[BELAVKIRIN: 10 Adar 2005] **Gelêrî**

amnesty international

(rêxistina lêborînê ya navneteweyî)

Sûrîye

Kurd li Komara Ereb a Surîyê

Salek pistî bûyerên Adara 2004an

Adar 2005

INTERNATIONAL SECRETARIAT, 1 EASTON STREET, LONDON WC1X 0DW, UNITED KINGDOM

[Belavkirin: 10 Adar 2005] **Gistî**

Amnesty International
(Sazîya Lêborînê ya Navneteweyî)

Sûrîye

Salek pistî bûyerên Adara 2004an Kurd li Komara Ereb a Surîyê

Adar 2005 **Kurtenivîs** **AI Index: MDE 24/002/2005**

Wekî Surîyeyîyên din, Kurdên li Sûrîyê jî bi binpêkirinên mafên mirovan re rûbirû bûne, lê wekî komekê, ew her weha ji cûdagirtinên nasnameyî jî dikisînin, ku rêgirtinen bo bikaranîna ziman û çanda Kurdî jî di nav wan de ne. Bi ser van de, parçekî mezin ê Kurdên Surîyê hatine bêdewletkirin û ji ber vê yekê, li gel bêparhistina mafê hemwelatîbûn û pasaportekê, ji îmkanên gistî yên xwendin, karkirin, tendurustî û mafên din yên ku bo hemwelatîyên Surîyê hene jî tên bêparkirin. Kurden ku mafên mirovan diparêzin, dema ku mijarên weha tînin rojevê, yan jî çalakîyên din ên mafên mirovan bi awayekî astîxwaz pêk tînin, bi taybetî di bin tehdîdên girtin, îskence, muameleya xerab, mehkemeyên neadil û ketina girtîgehê de ne.

Di 12 Adar 2004an de, li bakurê rojhilatê Surîyê, li Qamislo di maçeke fûtbolê de pevketinên di navbera alîgiran de bû sebeba mirina çend kesan – li gor agahdarîyan, ew hemî ji guleberdana hêzên ewlekarîyê pêk hatin. Endamên hêzên ewlekarîyê merasîmeke cenazeyê ya pistî wê û xwepêsana roja din gulebaran kirin, ku li gora agahdarîyan, bûne sebeba bêtir bîrîndarî û kustinan. Pistî van bûyeran, protesto û serhildanên ku du rojan ajot li Qamislo û bajarên din ên bi nifûseke mezin a Kurd li Bakur û Bakurê Rojhilat pêk hatin. Gelek avahîyên dewletê û yên kesan zirar dîtin û hatin sewitandin, û li gora ragihandinan, polîsek li Amûdê hat kustin. Li ba Amnesty International bi gistî navên qet nebe 36 mirovên kustî hene, hema hema hemî Kurd in

û tê bawerkirin ku ji alîyê hêzên ewlekarîyê ve hatine kustin. Bêtir ji 100 kesan birîndar bûn. Tê bawerkirin ku pistî bûyeran bêtir ji 2000 mirovan hatine girtin, ku hema hema hemi Kurd in. Di destpêka Sibata 2005an de bi qasî 200 kesan girtî mane, 15 ji wan ji bo Dadgeha Bilind a Ewlekarîya Dewletê hatin sewkkirin ku, prosedurên vê dadgehê li bin standardên navneteweyî yên darizandinên adil in.

Bi qasî ku tê zanîn, tu lêkolînên fermî li van mijaran çênebûne: çawa dibe ku esebîyeta li maçeke fûtbolê rê dide bo serhildanên belav; bikaranîna hêza kujdêr ji alîyê hêzên ewlekarîyê ve; hemî raporên belavbûna îskence û muameleya xerab a girtîyan; ji Adara 2004an û vir de mirinên pênc Kurdan ku tê îddîakirin ku ji ber îskence û xerabkarîya di bin çavan de qewimîne; di çend hefte û mehên pistî bûyerên Adarê de mirinên qet nebe ses Kurdên ku eskerî dikirin; an jî cûdagirtina Kurdan a sîstematîk û binpêkirinên mafên mirovan ku dibe ku rê dabin esebîyet û peqîna tundkarîyê.

Amnesty International bang li rayedarên Sûrîyê dike ku lêkolînên serbixwe û alînegir li hemî mijarên jorgotî bike û çareserîyên van binpêkirinan pêsniyar bike ku bibin alîkar ku di dahatûyê de pêsî li derketina bûyerên wek wan bigire.

PEYVÊN SEREKE:

Ev rapor kurteya dokumaneke 21-rûpel e (8,593 peyv), : Sûrîye: Kurd li Komara Ereb a Sûrîyê, Salek pistî bûyerên Adara 2004an (AI Index: MDE 24/002/2005) ji alîyê Amnesty International ve di Sibata 2005an de hat wesandin. Kesekî ku dixwaze li ser vê mijarê bêtir agahî bisitîne an çalakîyekê pêk bîne divê li dokumana gistî binêre. Gelek materyalên me yên li ser vê mijarê û mijarên din li http://www.amnesty.org peyde dibin û nûçenameyên Amnesty International dikanin bi rêya email bên sitendin:

http://www.amnesty.org/email/email_updates.html

INTERNATIONAL SECRETARIAT, 1 EASTON STREET, LONDON WC1X 0DW, UNITED KINGDOM

NEXSEYA SÛRÎYÊ

Sipas ji bo Pirtûkxaneyên Zanîngeha Teksasê, Zanîngeha Teksasê li Austin

NEXSEYA BELAVBÛNA NIFÛSA KURD



Bi destûra the Minority Rights Group International hat wesandin

NAVEROK

1. PÊSGOTIN 3
2. PISTGEH 4
a) Konteksta mafên mirovan 4
b) Sînorkirinên mafên Kurdan ên ekonomîk, civakî û çandî 5
Sînorkirinên bikaranîna zimanê Kurdî 5
Kurdên bêdewlet 5
3. PARÊZVANÊN MAFÊN MIROVAN BO KURDAN: ÎSKENCE, MUAMELEYA XERAB, ÇEWSANDIN Û DARIZANDINÊN NEREWA 7
a) Besdarvanên xwepêsana zarokan a Hezîrana 2003an 7
b) Wênekêsê xwendekar ên xwepêsana zarokan a Hezîrana 2003an 9
c) Besdarvanên xwepêsana Roja Mafê Mirovan 9
d) Mirovên ku tev li çalakîyên çandî û zimanî dibin 10
4. ÎDDÎAYÊN KUSTINÊN BÊDARIZANDIN Û MIRINÊN JI BER ÎSKENCE Û MUAMELEYA XERAB A LI DIJÎ GIRTÎYAN YÊN DEMA BÛYERÊN ADARA 2004AN Û PISTÎ WÊ 12
a) Îddiayên kustinên bêdarizandin di dema bûyerên adara 2004an de 12
b) Mirinên ji ber îskence û muameleya xerab a li dijî girtîyan 12
c) Mirinên Kurdên li eskerîyê ên di rewsên gumanbar de 13
5. ÎSKENCE, MUAMELEYA XERAB Û DARIZANDINÊN NEREWA PISTÎ BÛYERÊN ADARA 2004AN 14
a) Zarok 14
b) Sahidnameyên mezinên ku hatine berdan 15
c) Kurdên ku hîn girtî ne û rûbirûyî darizandina nerewa ne 17
6. TEMÎ 18

Sûrîye
Kurd li Komara Ereb a Sûrîyê
Salek pistî bûyerên Adara 2004an

1. PÊSGOTIN

Di Adara 2004an de, dîroka Kurdên li Sûrîyê ket fitlekeke tund. Di 12ê Adarê di dema maçeke fûtbolê li Qamislokê li bakurê rojhilatê Sûrîyê de, esebîyeta di navbera alîgirên Kurd û yên Ereb de bi awayekî dramatîk zêde bû, û hêzên ewlekarîyê bi gulebarankirina qerebalixîyê bersîv da, li gora ragihandinan tenê li besa Kurdan, û çend mirov kustin. Roja dû wê, endamên hêzên ewlekarîyê merasîmeke cenazê û xwepêsanek gulebaran kirin, li gora ragihandinan bûn sedema hejmarek kustî û birîndaran. Pistî van bûyeran, protesto û serhildanan du rojan ajot, li Qamislo û bajarên din li bakur û bakurê rojhilat, al-Qahtaniya, al-Malkiya û Amûdê jî di nav de. Gelek avahîyên dewletê û yên kesan zirar dîtin, an jî hatin sewitandin. Îstasyoneke polîsan li Amûdê bû armanca êrîsan û polîsek ji kevirên avêtî giran birîndar bû. Li ba Amnesty International bi gistî navên qet nebe 36 mirovên kustî hene, hema hema hemî Kurd in û tê bawerkirin ku ji alîyê hêzên ewlekarîyê ve hatine kustin. Bêtir ji 100 kesan birîndar bûn. Tê bawerkirin ku pistî bûyeran bêtir ji 2000 mirovan hatin girtin, ku hema hema hemû Kurd in. Piranîya wan li cîhên nenas di tecrîdê de hatin histin û îskence û xerabkarîyên belav li dijî girtîyan hatin raporkirin, ku zarok, jin û kal û pîr jî di nav de bûn. Di destpêka Sibata 2005an de bi qasî 200 kesan girtî mane, 15 ji wan ji bo Dadgeha Bilind a Ewlekarîya Dewletê (DBED) hatin sewkkirin ku, prosedurên vê dadgehê li bin standardên navneteweyî yên darizandinên adil in. Bi dehan xwendekarên Kurd ji zanîngeh û besên navxweyî yên zanîngehan hatin avêtin, ji wan qet nebe 11 ji Zanîngeha Samê di 18 Adar 2004an de hatin avêtin, li gora ragihandinan ji ber tevlêbûna protestoyên asitîxwaz. Bi qasî ku tê zanîn, tu lêkolînên fermî li van mijaran çênebûne ku, çawa dibe ku esebîyeta li maçeke fûtbolê rê dide bo serhildanên belav; an bo bikaranîna hêza kujdêr ji alîyê hêzên ewlekarîyê ve; an girtinên girseyî û ragihandinên belavbûna îskence û muameleya xerab a girtîyan; an jî sedemeke muhtemel a di bin van bûyeran de.

Kurdên li Sûrîyê jî wekî Surîyeyîyên din, bi binpêkirinên mafên mirovan re rûbirû bûne, lê wekî komekê, ew her weha ji cûdagirtinên nasnameyî jî dikisînin, ku rêgirtinên bo bikaranîna ziman û çanda Kurdî jî di nav wan de ne. Bi ser de jî, parçekî mezin ê Kurdên Surîyê hatine bêdewletkirin û ji ber vê yekê, li gel bêparhistina mafê hemwelatîbûn û pasaportekê, ji îmkanên gistî yên xwendin, karkirin, tendurustî û mafên din yên ku bo hemwelatîyên Surîyê hene jî tên bêparkirin. Kurden ku mafên mirovan diparêzin, dema ku mijarên weha tînin rojevê, yan jî çalakîyên din ên mafên mirovan bi awayekî astîxwaz pêk tînin, bi taybetî di bin tehdîdên girtin û ketina girtîgehê de ne, dozên ku li dijî wan tên vekirin bi qasî ku Amnesty International dizane bi piranî li dijî Kurdan tên vekirin û yên weha ne, "tevlêbûna hucreyên ku qelskirina siûra neteweyî û gijkirina pevketina mezheb û nijadan armanc dikin", "êrîskarîya bi armanca gijkirina serê navxweyî û serê navbera besên civakê û gijkirina kustinê", û "hewldana parçekirina axa Sûrîyê û tevlêkirina wê bo dewleteke biyanî". Vekirina dozên weha li gel "tevlêbûna

rêxistineke neqanûnî" ku pircar li dijî parêzvanên mafên mirovan ên ne-Kurd tê vekirin, dibe sedema darizandinên nerewa li Dadgehên Bilind ên Ewlekarîya Dewletê, an jî ên leskerî. Ceza herî giran bo "êrîskarîya bi armanca gijkirina serê navxweyî û serê navbera besên civakê û gijkirina kustinê" îdam e.

Ev rapor gelek binpêkirinên mafên mirovan ku di mînak û bûyerên taybetî yên du salên çûyî de li Sûrîyê hatine serê Kurdan bipelge dike. Bes 2 a raporê bi kurtî konteksta hiqûqî ku di nav wê de binpêkirinên weha bêtir gelemperî diqewimin rave dike, û nêrîneke gistî li ser sînorkirinên nasnameyî ku Kurdên Sûrîyê rûbirû dibin û tedbîrên cûdagirtinî yên ku bi tayberî bandûrê li Kurdên bêdewlet dikin, pêskês dike. Bes 3 wêneyekî dewreke xerabkarîya mafên mirovan ji dozên gelek parêzvanên mafên mirovan ên Kurd dide, ku hewl dane ku mafên gelê Kurd li Sûrîyê pêsde bixin. Bes 4 li ser ji Adara 2004an û vir ve bûyerên lêpirsîn-nekirî yên ku li gora ragihandinan, Kurd bê darizandin hatine kustin û mirinên ji ber îskence û xerabkarîya li dijî girtîyên Kurd radiweste. Bes 5 awayên îskence û muameleya xerab a girtîyên pistî bûyerên Adara 2004an rave dike, ku zarok jî di nav de ne. Di raporê de her weha temîyên li rayedarên Sûrîyê yên li ser binpêkirinên taybetî yên mafên mirovan, û lixwegirtinên Sûrîyê yên li gora peymanên navneteweyî yên mafên mirovan hene ku ew jî wek dewlet alîyek e.

2. PISTGEH

a) Konteksta mafên mirovan

Amnesty International û sazîyên din dokumentên binpêkirinên girîng ên mafên mirovan li Sûrîyê di nav gelek salan de pêk anîne[1]. Fikarên sereke ên Amnesty International li ser mafên mirovan li Sûrîyê evan dihundirînin: girtin û hepskirina keyfî ya mirovan, tenê ji ber ku mafên xwe yên mirovanî bi awayekî asitîxwaz bicîh anîne; "wendabûn"; girtina dem-dirêj a di bin tecrîdê de; bi firehî bikaranîna îskence û muameleya xerab a dema binçavkirinê; darizandinên nerewa; muafbûna endamên ewlekarîyê yên ji binpêkirinên mafên mirovan gumanbar; sînorkirinên giran ên azadîya ramanê û azadîya rêxistinî; çewsandina parêzvanên mafên mirovan; û bicîhanîna ceza kustinê.

Amnesty International hîn jî ji bo bicîhkirina Qanûna Rewsa Awarte (QRA) li Sûrîyê pir bifikar e. 8ê Adara 2005an dibe salvegera 42an a daxuyanîya QRA, ku sal bi sal qanûnên nuh lê tên zêdekirin û bûye sedema girtin, îskencekirin û bêyî darizandin di tecrîdê de histina bi hezaran dijberên siyasî, û yên din ku pistî darizandinên nerewa bo demên dirêj ên girtîgehê ji alîyê QRA an Dadgehên Leskerî ve ku Dadgehên Leskerî yên Ser (DLS) jî di nav de ne, hikum bûne û ceza xwarine.

---

[1] Binêrin, wek mînak, AI, Rapora Amnesty International bo Hikûmeta Komara Ereb a Sûrîyê, MDE 24/04/83, 1983; AI, Îskence ji alîyê Hêzên Ewlekarîyê ve, MDE 24/09/87, Cotmeh 1987; AI, binçavkirinên dem-dirêj û îskenceya girtîyên siyasî, MDE 24/12/92, Tîrmeh 1992; AI, Sûrîye: Çewsandin û muafbûn: qurbanîyên jibîrkirî MDE 24/002/1995, 1995; AI, di nakokîyeke herêmî de aliqî: Girtîyên siyasî ên Filîstînî û Urdunî li Sûrîyê, MDE 24/01/99, Çileyê Pasîn 1999; AI, Pêskêsîya bo Komîteya Mafên Mirovan, MDE 24/001/2001, Adar 2001; AI, Girtîgeha Leskerî ya Tadmur: Îskence, Bêhêvîtî û Nemirovkirin, MDE 24/014/2001, Îlon 2001; Sûrîye: Çewisandina azadîya ramanê: girtina rexnegirên siyasî, MDE 24/007/2002, Hezîran 2002.

Darizandinên DBEDê, ku li gora qanûnên rewsa awarte di 1968an de tenê ji bo mijûlbûna bi dozên siyasî û ewlekarîya dewletê hatiye afirandin, ne li gora standardên navneteweyî yên darizandinên rewa ne: meriv nikane li dijî biryarên wan îtiraz bike; mafê tawanbaran ê dîtina parêzeran sînorkirî ye; û desthilatîyên fireh ên keyfî bo dadgêran tên dayin. Di bin sîya QRA de, desthilatîyên awarte dan Dadgehên Leskerî, ku kapasîteya lênêrîna dozên li dijî sivîlan li gora Biryarname 46 a 1966an di nav wan de ye. Ev dadgeh serbixwe û alînegir xuya nakin, û rêzgirtinê li mafê tawanbar ê amadebûna li rûnistina dadgehê û pêskêskirina parastineke bi an bê alîkarîya nûnerê hiqûqî nakin. Dahnên darizandinên DLSan, ku dikanin li dozên li dijî sivîlan jî binêrin, dibe ku ji yek an du rûnistinan pêk bên, di gelek rewsan de di girtîgehekê de, ku li wê derê xuya dibe ku tawanbar hema tawanê xwe, an jî tistên ku pê hatine tawanbarkirin, qebûl dikin. Di hinek rewsên din de, tê ragihandin ku bêyî ku qet ji wan bê xwestin ku tev li rûnistineke dadgehê bibin, tawanbar ji cezayên ku xwarine tên haydarkirin.

b) Sînorkirinên li mafên Kurdan ên ekonomîk, civakî û çandî

Kurd li Sûrîyê duyemîn koma etnîkî ya herî mezin e. Ereb bi qasî 90%ê nifûsa nêzîkî 20 milyonan pêk tînin, Kurd li dor 1.5 – 2 milyonan an jî 10%ê nifuse ne, û hindikahîyên din bi qasî 1%. Piranîya Kurdan li dora Helebê li bakurê welêt û herêma Cizîrê li bakurê rojhilat kom bûne. Ev herêmên bi piranî Kurd ji alîyê civakî û ekonomîk ve li dû besên din ên welêt mane: rewsek e ku ji cûdagirtina rasterast û ya nerasterast li dijî nifûsa Kurd pêkhatiye.

Di 1962an de, hikûmeta Sûrîyê dest bi bicîhkirina siyaseteke "Erebkirinê" ya herêmên Kurdan kir, ku bi qasî 100,000 Kurd ji 300 gundan bi dare zorê hatin derxistin û li dewsa wan Ereb hatin bicîhkirin, armanca stratejîk afirandina 'kembereke Ereb' di navbera Kurdên Sûrîyê û Kurdên Tirkîyê û Iraqê bû. Navên Erebî li gelek gund û bajarên ku navên wan bi Kurdî bûn, kirin[2].

Sînorkirinên bikaranîna zimanê Kurdî

Li Sûrîyê, zimanê Kurdî wek zimanekî fermî nayê naskirin û li xwendegehan nayê hînkirin. Ji 1958an û vir ve, wesanên bi Kurdî hatine qedexekirin. Di 1987an de, li gora ragihandinan Wezîrê Çandê ev qedexe fireh kir ku lêxistin û belavkirina kaset û vîdyoyên Kurdî jî bihundirîne. Li gora hin çavkanîyan, qedexeya li ser hînkirina Kurdî li xwendegeh û zanîngehan di 1989an de bi Biryarnameyeke Nehênî hat teyîdkirin, ku her weha bikaranîna zimên li hemi avahîyên fermî qedexe kir[3]. Raporên neteyîdkirî hene ku rayedarên dewletê berî 2002an, ceza herî giran a çapkirina bi Kurdî û her weha hînkirina Kurdî rakiriye pênc salên girtîgehê. Li gora ragihandinan bikaranîna Kurdî li pîrozbahîyên taybetî û kargehan jî qedexe ye[4].

---

[2] Name, ji Yahya Abu Alî, Wezîrê Birêvebirîya Herêmî, 20 Çileyê Pasîn 1997, balê dikisîne ser Qayde No. 36, 11 Tebax 1971, û Qanûn No. 56 (15 Tîrmeh 1980) [tê vegotin li Kerim Yildiz û Georgina Fryer, Kurd: Mafên çandî û zimanî KHRP, Tebax 2004, r89].

[3] Biryarnameya Nehênî No. 1856-S25, 1 Mijdar 1989 [tê vegotin li Yildiz û Fryer, r255].

[4] Biryarname No.2013S52, tê vegotin li Mohammad Mullah Ahmad, al-Qadhiya al-Kurdiya fi Suyiya (2001), r81 [tê vegotin li Yildiz û Fryer, r87].

Lê belê di pratîkê de, xuya dibe ku belavkirina hejmarek piçûk a materyalên Kurdî çav jê re tê girtin û di 2004an di ferhengeke Erebî-Kurmancî (zarava Kurdî ku ji alîyê Kurdên 'bakur' ve -Sûrîye jî di nav de- tê bikaranîn) ku destûra fermî jê re hatibû sitendin, li gora ragihandinan, hat çapkirin. Her weha qedexeya bikaranîna zimanê Kurdî û materyalan xuya ye ku bi sivikahî tê bicîhkirin. Li gel vê jî, her çiqas hindikahîyên din ên li Sûrîyê ku yên sereke Ermenî, Çerkez, Asûrî û Cihûd in, destûra birêvebirina xwendeghên taybetî hebin jî, bo Kurdan destûr tune. Li parêzgeha bi piranî Kurd a Hesekî qedexe ye ku karsazî navên bi Kurdî li xwe bikin[5]. Bi bervacî, karsazî dikanin navên Ermenî û Erebî, an Rûsî û Erebî li xwe bikin, û xuya ye ku tu sînorkirinên hiqûqî ji bo bikaranîna zimanên din, an wesandina materyalan bi zimanên din tune. Di 1992an de Wezîrê Karên Hindur li parêzgeha Hesekî qeydkirina zarokên navên wan 'ne bi Erebî' qedexe kir[6]. Di van salên çûyî de, bi dehan Kurd ji ber têkilîya bi tevlêbûna pîrozbahîyên Newroza Sersala Kurdan hatine girtin[7].

Sazîyên Neteweyên Yekbûyî (NY) fikarên li ser cûdagirtina li dijî Kurdan anîne zimên, ku Komîteya Mafên Ekonomîk, Civakî û Çandî ya NY jî di nav de ye, ku bi xurtî temî kiriye ku rayedarên Sûrîyê: "tedbîrên bibandûr ji bo serê li dijî cûdagirtina di pratîkê de, bi taybetî ya li dijî Kurdan, bisitînin. Tedbîrên weha divê bi taybetî çêtirkirina qeydên zayinê û çûyina xwendegehê û histina bikaranîna zimanê xwe û bi awayên din îfadekirina çanda xwe armanc bikin."[8]

Kurdên bêdewlet

Qet qeydên fermî yên pêbawer peyde nabin, lê belê tê texmînkirin ku nuha li dora 200,000 û 360,000 Kurdên Sûrîyê hene, ku mafên wan ên hemwelatîya Sûrîyê tune û ji ber vê yekê ji mafên hemwelatîyan tên bêparkirin. Ji 1962an û vir ve, ev Kurdên bêdewlet bi du çînên fermî hatine tesnîfkirin: *ecenîb* ('biyanî') û *maktûmîn* ('bi dizî', tê wateya 'neqeydkirî'), evana ji ecenîban jî kêmtir maf hene. Wek encama Qanûna 93an a 1962an û serjimêrîya bi wê ve girêdayî li parêzgeha Hesekî, bi qasî 120,000 Kurd ji hemwelatîya Sûrîyê hatin xistin, an jî mafê dozkirina wê ji wan hat sitendin, ger nikanibin îspat bikin ku ji 1945an, an berî wê û vir ve li Sûrîyê jiyane[9]. Gelek rapor hene ku serjimêrî keyfî hatiye birêvebirin. Ji bo van Kurdên bêdewlet pasaport an dokumentên din ên rêwîtîyê nayên dayin, û ji lew re nikanin bi rêya hiqûqî ji Sûrîyê derkevin, an jî lê vegerin. Dokumentên wan ên rast tunin ku li nexwesxaneyên dewletê tedawî bibin. Mafê wan tuneye ku deng bidin, an memûretîyê bikin. Xwedîtîya xanî, erd an karsazîyekê ji bo wan qedexe ye. Karên wek parêzer, rojnamevan, mihendîs, doctor an pîseyekî din ku endametîya sendîkayeke pîsetîyê – ku ji bo Kurdên bêdewlet destûr tune- pêwîst bike ji bo wan qedexe ye; û memûretîya dewletê ji bo wan qedexe ye. Zarokên *Maktûmîn* nikanin ji sinifa nehan û wê de biçin xwendegehê. Li gel sînorkirinên weha ên xebatê, li

[5] Ferman No. 933, 24 Sibat 1994 [tê vegotin li Yildiz û Fryer, r88].
[6] Biryarname No. 122 [tê vegotin li Yildiz û Fryer, r88].
[7] Wek mînak binêrin li, AI, Rapora Salane 1997, r300; AI, Rapora Salane 1998, r322.

[8] Binêrin E/C.12/1/Add.63
[9] A rastî, di 1920an de bi hezaran Kurd di sînorê nuh-afirandî yê di navbera Sûrîye û Tirkîye re ji ber xizanî û çewisandinê revîyabûn.

gel nebûna zanîngehan li herêma Cizîrê, û li gel ku çûyina *Maktûmînan* a zanîngehan bi gistî qedexe ye, perwerdeya bilind ji bo nisbeteke mezin a nifûsa Kurd li Sûrîyê ne bijarteyek e[10].

Komîteya Mafên Zarokan a NY, Komîteya Mafên Mirovan a NY, Komîteya Rakirina Cûdagirtina Nijadî ya NY, û Komîteya Mafên Ekonomîk, Civakî û Çandî hemûyan fikarên xwe yên li ser wan cûdagirtinan anîne zimên, ku Kurdên li Sûrîyê tên dinyê, rûbirû dibin[11].

3. PARÊZVANÊN MAFÊN MIROVAN ÊN KURD: ÎSKENCE, MUAMELEYA XERAB, ÇEWISANDIN Û DARIZANDINÊN NEREWA

a) Besdarvanên xwepêsana Hezîrana 2003an

Di 25 Hezîran 2003an de, komeke 100-200 zarok û mezinan li dervê Fona Zarokan a NY (UNICEF) li samê kom bûn û doz kirin ku rêzdarî bo mafên zarokên Kurdên Sûrîyê bê girtin, mafê ji alîyê NY ve naskirî yê ku mafê hemwelatîyê ji bo herkesî hebe û mafê hînbûna zimanê xwe di nav de[12]. Li gora ragihandinan amadekaran daxuyanîyek pêk anîbûn û plan dikirin ku radestî karmendên UNICEF bikin, di wê daxuyanîyê de sînorkirinên li ser qeydkirina navên Kurdî û cûdagirtina li dijî zarokên Kurd di nav sîstema perwerdê de dihat ravekirin. Protestoya a sitîyane ji alîyê polis û hêzên ewlekarîyê ve hat sikandin û li dor 20 kesan di wê navê de hatin birîndar kirin.

Heft protestovan, hemû zilam hatin girtin, di tecrîdê de hatin histin û li gora ragihandinan li saxê ewlekarîyê yê Îstasyona Polîs a al-Mezze li Samê 23 rojan îskence li wan hat kirin û dûre birin Girtîgeha Adra ya nêzîkî Samê, li wir di hucreyên piçûk de hatin tecrîdkirin û bêtir muameleya xerab dîtin. Ji bo çend mehan nehistin ku zilam malbat, parêzer û doktoran bibînin. Hat gotin ku di Tebax an Îlona 2003an de çavgirtî û bêyî nûnerên hiqûqî derxistin ber DBEDê. Girtîyekî bi navê **Mihemed Mistefa** li DBEDê got ku hucreya wî ya li Girtîgeha Adra bi rastî tûwaleteke qulika wê nixumandî bûye.

---

[10] Ji bo bêtir agahîya li ser Kurdên bêdewlet li Sûrîyê, binêrin wek mînak,: Human Rights Watch, *Kurdên Bêdengkirî, 1996*, www.hrw.org/reports/1996/Syria.htm; *Rapora Xizmeta Penaberîyê ya Denmarkî ya mîsyona dîtina rastîyê bo Sûrîye û Lubnanê*: *Serdên Kurd û Fîlîstînîyên bêdewlet li Sûrîyê hwd*., 17-27 Îlon 2001, http://www.ecoi.net/pub/ds194_02376syria.pdf; Komela Mafên Mirovan a Sûrîyê (HRAS), *Bandûra Nedana Hemwelatîyê li Kurdên Sûrîyê*, Mijdar 2003, http://www.hras-sy.org/.

[11] Komîteya Mafên Zarokan xemgînîya xwe anîye zimên ku ji bo zarokên dê û bavên Kurd ên ku li Sûrîyê hatine dinyê û di zayinê de qet hemwelatîyeke din tune hemwelatîya Sûrîyê nayê dayin û rûbirûyî cûdagirtinan dibin, li dijî xal 2 û 7 a Konvensîyonê, (CRC/C/15/Add.212); Komîteya Mafên Mirovan fikarên xwe yên li ser "qedera Kurdên ku li Sûrîyê hatine dinyê ku rayedarên Sûrîyê muameleya biyanîyan an kesên neqeydkirî bi wan dike û ku di bidestxistina hemwelatîya Sûrîyê de rastî dijwarîyên birêvebirî û pratîkî dibin, anîne zimên. Komîte vê rewsa cûdagirtinî li dijî xal 24, 26 û 27 ên Peymanê dibîne." (Binêrin: CCPR/CO/71/SYR); Komîteya Rakirina Cûdagirtina Nijadî bêtir çalakî temî kiriye ku mafên hemû kesên aîdî komên etnîkî û neteweyî bên parastin ku bêyî cûdagirtin mafên sivîl û siyasî yên di xal 5 a Konvensîyonê de rêzkirî, bi taybetî mafê hemwelatîyê û azadîya çandî bikar bînin. Bi taybetî, Komîte temî dike ku Dewlet qanûnsazîya xwe ya hemwelatîyê pêsçav bike ku çareserîyeke bilez bo rewsa Kurdên li Sûrîyê hatine dinyê û zarokên penaberan ên ku li Komara Ereb a Sûrîyê hatine dinyê bibîne. (Binêrin CERD/C/304/Add.70 para 14); binêrin jêrenot 10, Binêrin E/C.12/1/Add.63.

[12] Li gora ku tê ragihandin çalakî hat plankirin ku rastî Roja Zarokan a Navneteweyî bê, lê belê ya rastî divê ev di Yeksema dudan a Çileyê Pêsîn de be.

Girtîyekî din li dadgehê gilîyê muameleya xerab a ku wî li girtîgehê dîtibû kir, girtîyê sisêyan got ku ew dixwaze ji bo îskenceya ku dîtiye dozê li rayedarên girtîgehê û Muxaberatê veke, û ku sopên îskencê hîn jî li ser lasê wî xuya dibin. Serokê Dadgehê gilî red kirin û ferman da ku girtîyan bibin odeya girtîyan a Dadgehê. Li gora ku tê zanîn ji bo gilîyên wan ên îskencê tu lêpirsîn nehatine birêvebirin. Di 27 Hezîran 2004an de, heft zilam gist ji bo "tevlêbûna rêxistineke neqanûnî" û "hewldana veqetandina parçeyek ji axa Sûrîyê û tevlêkirina wê ya

Xwepêsan li dervê avahîya UNICEF, Sam, banga naskirina mafên zarokên Kurdên Sûrîyê, Hezîran 2003 © taybetî

dewleteke biyanî"hukim xwarin; Kurdên Sûrîyê pir caran ji bo tevlêbûna xwepêsanên asitîyane û çalakîyên din ên asitîyane bi vî sûcî tên sûcdarkirin. **Mihemed Mistefa, Serîf Remezan** û **Xalid Ehmed Alî** du sal ceza girtîgehê xwarin. Çar kesên din - **'Amr Mûrad, Salar Salih, Hosam Mihemed Emîn** û **Huseyn Remezan** – salek ceza xwarin û ji ber dema ku berî rûnistina dadgehê girtî mabûn, yekser hatin berdan. Li gora ragihandinan Mihemed Mistefa, Serîf Remezan û Xalid Ehmed Alî hîn jî li Girtîgeha Adra muameleya hovane, ne mirovîn û heqaretî dibînin. Ew di bin tecrîdê de ne û bi piranî têkilîya wan bi kesekî re çênabe. Ew tenê dikanin ji du mehan carekê di serdaneke 30 deqîqe de endamên malbata nêzîk bibînin, lê belê divê berê destûrê ji Besa Siyasî ya Ewlekarîyê bisitînin. Di serdanan de karmendekî ewlekarîyê amade ye û destûra bi Kurdî peyivînê tune. Tê ragihandin ku Serif Remezan û Xalid Ehmed Alî di hucreyên 1m x 1.5m de dimînin, û serûberê hucreya Mihemed Mistefa, "tûwalet", 80cm x 80cm ye.

Amnesty International van zilaman wek girtîyên ramanê dibîne, ku tenê ji ber îfadekirina nêrînên xwe ya asitîyane hatine girtin[13].

b) Wênekêsê xwendekar ê xwepêsana zarokan a Hezîran 2003an

Mesûd Hemîd, xwendekarekî rojnamevanîyê li Zanîngeha Samê, pistî ku wêneyên xwepêsanê kisandin û ji çend sîteyên Înternetê re sandin, www.amude.com a li Elmanyayê jî di nav de, ji alîyê zabitên Ewlekarîyê yên besa siyasî ve di 24 Hezîran 2003an de hat girtin. Ew li bazkê siyasî yê Girtîgeha Adra girtî ma, di 10 Cotmeh 2004an de ji alîyê DBEDê ve ji bo endametîya "rêxistineke neqanûnî" û "hewldana veqetandina parçeyek ji axa Sûrîyê û tevlêkirina wê ya dewleteke biyanî" hukim xwar. Pênc sal ceza girtîgehê danê û di hucreya tecrîdê de tê histin. Di Çileyê Pêsîn 2004an de, hat raporkirin ku pistî darizandina xwe, wî ji bo protestokirina rewsa ku ew tê de girtî tê histin dest bi grewa birçîbûnê kir. Mesûd Hemîd yek ji çend kesan e ku di 2004an de ji bo bikaranîna Înternetê hukim xwarine, Amnesty International hemûyan wek girtîyên ramanê dibîne[14].

c) Besdarvanên Xwepêsanên Roja Mafên Mirovan



Merwan Osman © taybetî

Hesen Salih û **Merwan Osman** li xwepêsaneke li dervê Meclîsa Mafên Mirovan a ku li seranserî dikir. Xwepêsanvanan bang li awayekî fermî hebûna neteweya welêt de nas bike, astengên li ber û hemû girtîyên siyasî berde. endamên sereke yên Partîya rojên din, gava ku wek ku ji wan Wezîrê Karên Hundir ê wê demê bibînin, hatin girtin. Li gora Pêsîn 2002an de bêyî nûnerên Dadgeha Leskerî, li wir ji bo di 10 Çileyê Pêsîn de tev Gel li Samê bûn, ku Roja cîhanê tê naskirin pîroz hikûmetê dikir ku bi Kurd di nav yekîtîya ziman û çanda Kurdî rake Herdu zilam ku herdu jî Yekîtî ya Kurdî ne, pênc hatibû xwestin, çûn ku general Alî Hamûd ragihandinan di 20 Çileyê hiqûqî derketin ber "tevlêbûna rêxistineke neqanûnî" doz li wan hat vekirin. Ew berê li Besa Siyasî ya Ewlekarîyê li Samê girtî man, pistî girtina tecrîdî ya du meh û nîvan, destûr dan wan ku endamên malbata nêzîk werin serdana wan. Her serdanek bi 15 – 30 deqîqan hat sînorkirin û li pas caxan bi hebûna karmendekî ewlekarîyê hat pêkanîn. Hat ragihandin ku li Besa Siyasî ya Ewlekarîyê karmendên ewlekarîyê li herduyan jî xistin, û ji bo demên dirêj nehistin ku parêzer û doktor bên serdanê. Fikar bi taybetî ji bo tendurustîya Hesen Salihê sêst salî hebûn, ji ber ku bi wî re êsên singe hebûn û rê nedidan tedawîya tibbî.

Di Adara 2003an de, Dadgeha Leskerî "gijkirina pevketina civakan" jî li doza destpêkê zêde kiribû, doz bo DBEDê sewk kir û wan jî dozeke zêdekirî ya "hewldana veqetandina parçeyek ji axa Sûrîyê û tevlêkirina wê bo dewleteke biyanî" pêve kirin.

---

[13] Binêrin, wek mînak, AI, Sûrîye: Divê girtîyên ramanê yên Kurd yekser bên berdan, MDE 24/02/2004, 9 Çileyê Pasîn 2004.

[14] Binêrin, wek mînak, AI, Sûrîye: Ji bo bikaranîna înternetê ceza xwarin - Amnesty International bang dike ku çewisandina mafê azadîya ramanê bidawî bê, MDE 24/017/2004, 12 Adar 2004.

Tenê destûra bi kurtî peyivîna bi parêzerekî re ji bo wan hebû, li gora ragihandinan sê – çar deqîqe, li navenda girtinê ya DBEDê di paceyekê re. Pêştî girtina bo hema hema salekê, ew hatin transferkirin bo navendeke girtinê ya Polîsê Leskerî, li wê derê li gora ragihandinan îskenceya fîzîkî û psîkolojîkî dîtin, ku li pês karmendên ewlekarîyê û girtîyên din tazîkirin jî di nav de bû. Dûre dadgêrekî leskerî fermana sandina wan bo Girtîgeha Adra da, li wê derê bi qasî sê mehan di tecrîdê de hatin histin. Di Sibata 2004an de DBEDê ji bo wan hukimê "hewldana veqetandina parçeyek ji axa Sûrîyê û tevlêkirina wî bo dewleteke biyanî" da. Sê sal ceza girtîgehê da wan ku Serokê Dadgehê ew tavilê daxist 14 mehan, ewqasî ji xwe di girtîgehê de mabûn, û di 24 Sibat 2004an de hatin berdan. Amnesty International herdu zilaman jî wek girtîyên ramanê dibîne[15].

Merwan Osman di 15 Adar 2004an de, di dema girtinên girseyî yên Kurdên Sûrîyê li bakurê welêt de dîsa hat girtin. Li gora ragihandinan, dema ku li Beşa Siyasî ya Ewlekarîyê li Qamislokê girtî bû, karmendekî ewlekarîyê lêxist û zirar da diranên wî û çavekî wî. Pistî ku roja dû wê hat berdan, ji bo rakirina diranekî sikestî operasyonek lê bû.

d) Mirovên ku tev li çalakîyên çandî û zimanî dibin

Her çiqas rayedarên dewletê çav li belavkirina hejmareke piçûk a wesan û muzîka Kurdî, û bi taybetî li gundan pêkanîna hin çalakîyên çanda Kurdî digirin jî, dîsa jî amadekar û besdarvanên çalakîyên çandî û zimanî yên Kurdî di bin rîska çewisandin, girtin, îskence û muameleya xerab, û ketina girtîgehê de ne. Di 2001an de **Hebîb Îbrehîm** li Qamislokê klubeke çandî saz kir ku dîyaloga Kurdî-Erebî pêsde bixe. Di dema dersekê de, hêzên ewlekarîyê hatin û klub girtin. Li gora ragihandinan du ji endaman hatin girtin, û di bin çavan de îskence û muameleya xerab dîtin, û gelek seetan di tûwaletekê de girtî man.

Di bûyereke din de, **Mihemed Hemo**, xwedîyê dikaneke pirtûkan li Helebê ji 27ê Tebaxê heta 3ê îlona 2001an girtî ma, li gora ragihandinan ji ber tevlêbûna wî ya belavkirina wesanên Kurdî. Bêyî ku doz lê vebe hat berdan, lê belê gef lê xwarin ku, ger "hevkarî"ya rayedaran neke, wê dikana wî bê girtin[16].

Îbrehîm Nasan di 8 Çileyê Pasîn 2002an de li Helebê ji ber têkildarîya bi belavkirina materyalên çandî û perwerdeyî yên bi zimanê Kurdî hat girtin. Li gora ragihandinan qet nebe ses mehan li Saxê Binçavkirinê yê Ewlekarîya Dewletê li Kafr Sûsa li Samê di tecrîdê de hat histin, û dûre ji alîyê DBEDê ve sê sal ceza girtîgehê xwar. Amnesty International di 20 Tebax 2002an de ji rayedarên Sûrîyê re nivîsand û doza berdana wî kir, lê belê tu bersîv nesitend. Di Çileyê Pasîn 2005an de bi qedandina ceza xwe re hat berdan.

Di 30 Tebax 2003an de, **Xelîl Sileyman** hat girtin, pistî ku wî ji bo pîrozkirina mezûnîyeta komek xwendekaran partîyek saz kir ku tê de sitranên Kurdî hatin gotin. Ji alîyê Dadgeha Leskerî ve doza gijkirina kîna nijadî lê hat vekirin – lê belê dûre doz hat xistin û di 18 Çileyê Pasîn 2004an de hat berdan.

---

[15] Binêrin, wek mînak, AI, Sûrîye: Her sê girtîyên ramanê berdin, MDE 24/014/2004, 20 Sibat 2004.
[16] AI Rapora Salane 2002, r237.
[17] AI, Çalakîya Acil 107/04, MDE 24/018/2004, 12 Adar 2004.

Di 8 Adar 2004an de, heft Kurd ji bo têkilîya bi pîrozbahîyên bi Muzîka Kurdî yên Roja Jinan ku li seranserî dinyê tê naskirin, li derdora Hesekî hatin girtin[17]. Li gora ragihandinan pistî binçavkirina çend rojan hatin berdan.

4. ÎDDIAYÊN KUSTINÊN BÊDARIZANDIN Û MIRINÊN JI BER ÎSKENCE Û MUAMELEYA XERAB A DI DEMA BINÇAVKIRINÊ DE, DEMA BÛYERÊN ADARA 2004AN Û PISTÎ WAN

a) Îddiayên kustinên bêdarizandin di dema bûyerên adara 2004an de

Di dema bûyerên ku li stadyûma fûtbolê li Qamislokê di 12ê Adarê de dest pê kir de, qet nebe 36 mirov hatin kustin. Hema hema hemû Kurd bûn û xuya dibû ku ji ber bikaranîna hêza kujdêr a hêzên ewlekarîyê hatin kustin. Bi qasî ku tê zanîn tu lêpirsînên fermî bo rêze-bûyerên ku bûn sedema serhildanên belav, an bikaranîna hêza kujdêr a hêzên ewlekarîyê, an girtina girseyî û raporên îskence û muameleya xerab a pistî wê, an jî sedemên muhtemel ên di bin van bûyeran de nehatin birêvebirin.

Raporên nefermî xuya dikin ku amadekarîyên ewlekarîyê yên li stadyûma al-Baladî kêm bûne û ku hêzên ewlekarîyê bêmêzîn guleyên rastî li qerebalixê barandine. Dibe ku nebûna diyar a amadekarîyên polîsî yên nekujdêr li stadyûmê û di dema xwepêsanan de bûbe yek ji sedemên bilez belavbûna sidetê. Li gora Prensîbên Sereke yên Neteweyên Yekbûyî li ser Bikaranîna Hêz û Çekan, divê karmendên bicîhkirina qanûnê, berî ku dest bi bikaranîna hêzê û çekan bike, heta ku dibe, pêwengên ne-sidetî bikar bînin û hisyarîyeke zelal a mebesta xwe ya bikaranîna çekan bidin û demeke minasib lê hêvîya bicîhanîna wê hisyarîyê bimînin. Prensîb her weha diyar dike ku bikaranîna bi zaneyî ya çekên kujdêr tenê dikane di wê rewsê de be ku ji bo parastina jiyanê wekî din çare tunebe.

b) Mirinên ji ber îskencê û muameleya xerab di dema binçavkirinê de

Bi firehî bikaranîna îskencê li girtîgeh û navendên binçavkirinê yê Sûrîyê bas hatiye pelgekirin. Bi salan, Amnesty International qet nebe 38 awayên guhertî yên îskencê ku karmendên ewlekarîyê yên Sûrîyê bikar tînin qeyd kirine[18]. Mirinên ku li gora ragihandinan ji ber îskence û muameleya xerab a di dema binçavkirinê de, di awayên guhertî yên bûyeran de hatine raporkirin, girtî çi siyasî çi tawanbarên adetî dibin, û orîcîna wan a etnîkî û hemwelatîbûna wan çi dibe bila bibe. Lê belê, zêdebûneke berbiçav a hejmara mirinên Kurdên girtî yên ragihandî di hefte û mehên pistî bûyerên Adara 2004an de qewimî, li gora ragihandinan hemû ji ber îskence û muameleya xerab a di dema binçavkirinê de. Pênc ji neh mirinên bi vî rengî yên ku di ses mehên pistî Adara 2004an de bo Amnesty International hatin ragihandin, Kurd bûn. Pênc kesên ku gista wan li gora ragihandinan di tecrîdê de girtî man û doz li wan venebûn ev in: **Huseyn Hemo Naso**, 23, ku di 6ê Nîsanê de mir, li gora ragihandinan pistî îskence û nedana tedawîya taybetî ya tibbî bo dîyabeta wî; **Ferhad Mihemed Alî**, 19, ku di 8ê Nîsanê de mir, li gora ragihandinan pistî îskencê; **Ehmed Huseyn Hesen** (her weha wek Ehmed Huseyn

[18] Binêrin, wek mînak, AI, Sûrîye: Îskence ji alîyê Hêzên Ewlekarîyê ve, MDE 24/09/87, Cotmeh 1987; AI, Sûrîye: Girtîgeha Leskerî ya Tadmur: Îskence, Bêhêvîtî û Nemirovkirin, MDE 24/014/2001, Îlon 2001; AI, Sûrîye: Darizandinên nerewa ên girtîyên ramanê yên Kurd û îskencekirina zarokan qet nayê qebûlkirin, MDE 24/048/2004, 29 Hezîran 2004; AI, Sûrîye: Divê rayedarên dewletê lêpirsîna mirinên dema binçavkirinê bikein û dawî li îskence û muameleya xerab bînin, MDE 24/053/2004, 11 Tebax2004.

Huseyn jî tê gotin), ku di 1 an 2ê Tebaxê de, li Saxê Muxaberata Leskerî yê Hesekî mir û lasê wî bêyî ku ji bo dîtina kesekî destûr bê dayin hat vesartin; **Ehmed Mamo Kenco**, 37, di 3ê Tebaxê de ji ber xwîngirtina mejî mir, ku encama birînên serî yên ji lêdana dewrîyeke ewlekarîyê li Ras al-'Ayn û dema binçavkirinê ya Nîsan û Gulanê bûn; û **Hanan Bekir Dîko**, li gora ragihandinan di navbera 16ê Îlonê dema ku karmendên Muxaberata Leskerî ew li Helebê girt û 22ê Îlonê dema ku lasê wî radestî malbata wî kirin de miriye. Li gora ragihandinan li lasê wî sopên îskencê, dewsa birînan li stû, ling û pista wî û birîn li tasa sere wî hebûne. Bi qasî ku tê zanîn ji bo tu ji van mirinan qet lêpirsîn nehatine birêvebirin[19].

Xeyrî Berces Cando, li eskerîyê li gora ragihandinan di Adara 2004an de ji ber lêdana dem-dirêj a qet nebe zabitekî mir
© taybetî

Li gora ku Amnesty International dizane, tu lêpirsîn an lêkolîn tucarî li mirinên di binçavkirinê de, ewên ku tên îddiakirin ku ji ber îskence an muameleya xerab in jî di nav de, nehatine kirin ku ev yek dibe sedema binpêkirina Prensîbên NY ên Bibandûr Pêsîlêgirtin û Lêpirsîna Kustinên Neqanûnî, Keyfî û Yekser.

c) Mirinên eskerên Kurd di rewsên gumanbar de

Bi qasî ku tê zanîn, tu lêpirsîn li tu ji ses mirinên di rewsên gumanbar di hefte an mehên pistî bûyerên Adarê de, yên Kurdên ku eskerî dikirin, nehatiye kirin. Li gora ragihandinan mirin ji ber lêxistin an guleberdana rutbebilind an hogirên wan qewimîne.

Xeyrî Berces Cando, 21, Kurdekî Êzîdî, di 7 Adar 2004an de dest bi eskerîya xwe ya mecbûrî li baregehên al-Qutayfa kir, ku 25km li bakurê rojhilatê Samê ye. Pistî peqîna tundkarîya ji 12ê Adarê û pey ve, bavê wî yê bifikar, Sêx Berces Cando ji gundê Saradeka nêzîkî Hesekî çû baregehan, û di 22ê Adarê de, li gora ragihandinan, pistî li bendê mayina bi seetan, histin ku lawê xwe bibîne. Li gora ragihandinan Xeyrî Berces Cando nikanîbû bimesîya û du hogirên wî ew li ser lingan digirtin. Çavên wî û rûyê wî xerab werimîbûn û wî gotiye ku qet nebe zabitekî ku navê wî dûre di medya Kurdî û Elmanî de hat wesandin, bi seetan bi copan li las û sere wî xistiye û daye ber pehînan. Lêdanan di 21ê Adarê, Newroza Sersala Kurdan de dest pê kiribûn. Li gora ragihandinan, ew li gel çar eskerên ciwan ên Kurd ên din ku li wan jî dane, ji ber Kurdbûna xwe birine ba zabitê fermandarê wî. Li gora ragihandinan, ew li ber bavê xwe gerîyaye ku wî ji baregehan derxîne, ji ber ku jîyana xwe di xeterê de didît. Ew di nexwesxaneyeke leskerî de di 24ê Adarê de ji ber birînan mir. Qet otopsî nehat kirin. Lasê wî ji alîyê zabitên leskerî ve bilez û ne li gora kevnesopîyên Êzîdîyan li goristaneke nêzîkî Saradek hat vesartin.

[19] Di 18 Hezîran 2004an de, Amnesty International ji Wezîrê Karên Hundir ê wê demê General Aliî Hamûd re nivîsand, û selalkirina rewsên pênc mirinên di 2004an de doz kir, lê belê tu bersîv nesitend. Nameyeke wek wê di Tebaxa 2003an de ji Wezîrê Karê Hundir re li ser mirina Xelîl Mustefa bîn Muhemed Serîfê Kurdê Sûrîyê ya dema binçavkirina li Navenda Binçavkirinê ya Muxaberata Leskerî li Helebê hat sandin jî bêbersîv ma. Raporên ku Amnesty International sitendin îddia dikirn ku birîn û sopên birînan li ser lasê wî xuya dibûn, lingekî di du cîhan de êikestî, çavekî wendayî û birêneke serî di nav de.

Pênc dozên din jî ji Amnesty International re hat raporkirin. Di 6 Gulan 2004an de **Huseyn Xelîl Hesen** dema ku eskerîya xwe li Tabûra parastina Hewayî li Ras al-Basita li perava rojava dikir, li gora ragihandinan di rewsên gumanbar de hat kustin. Di 15ê Gulanê de, lasê eskerekî bi navê **Zîya al-Dîn Nûrî Nasr al-Dîn,** bi du birînên guleyan di serî de ji bo malbata wî hat radestkirin. Di Hezîranê de, **Qasim Mihemed** li gora ragihandinan di rewsên gumanbar de, ku nehatine zelalkirin, dema ku eskerîya xwe li al-Kiswaha li Basûrê Samê dikir, bi guleyan hat kustin. Di Tebaxê de, lasê Bedîa Celo Delefê 19 salî ji bo malbata wî hat radestkirin – li gora rayedarên dewletê – dema ku eskerîya xwe li parêzgeha Hamayê dikir, ji krîza dil miriye. Li gora ragihandinan, vê care jî wek carên din, bêyî otopsî hat vesartin. Dîsa li baregehên al-Qutayfa di 24 Cotmeh 2004an de, **Mihemed Sêx Mihemed** ji pasîyê ve gule xwariye û miriye. Li gora ragihandinan di tu ji van mirinên gumanbar de qet destûra otopsîyê nehatiye dayin û qet nebe di bûyerekê de, li gel delîlên zêde ên li dijî wê, zor dane malbata mirî ku daxuyanîyekê bidin ku qet pêwîstîya otopsîyê tunebûye. Di hinek bûyeran de ku malbatên mirîyan li gel sazîyên hiqûqî serî lê dane ku destûra dozvekirina li dijî kesên ku li gora îddiayan tev li kustinan bûne, dozê vekin, li gora ragihandinan serîlêdan hatine redkirin. Amnesty International di heman demê de, tu raporên eskerên ne-Kurd ku di rewsên gumanbar de hatibin kustin, nesitendiye.

5. ÎSKENCE, MUAMELEYA XERAB Û DARIZANDINÊN NEREWA YÊN PISTÎ BÛYERÊN ADARA 2004AN

a) Zarok

Komîteya NY a Mafên Zarokan di pêsçavkirina rapora dudan a perîyodîk a rayedarên Sûrîyê di 2003an de, fikarên xwe anîn zimên ku sînorkirinên tund ên girtina ciwan û zarokan a berî dadgehkirinê di pratîkê de nehatiye bicîhkirin, û ku serdên navendên binçavkirinê pirê caran dijwar in[20]. Pistî bûyerên Adara 2004an, Amnesty International raporin sitendin ku zarokên heta dozdeh salî piçûk di bin çavan de hatine îskencekirin.

Çar xwendekarên 12 û 13 salî ên Kurd, **Nêçîrvan Salih Mahmûd, Ehmed Sêxmûs Abdulah, Welat Mihemed Seîd** û **Serbest Sêxo** di 6 Nîsan 2004an de ji alîyê karmendên Ewlekarîya Siyasî ve, xuya ye ji ber pevçûneke wan û zarokên Ereb, hatin girtin. Çar zarokên Kurd derxistin pês Dadgeha Cezayên Giran a Piçûkan li Hesekî û doza "gijkirina pevketina civakî" li wan hat vekirin. Li Besa Piçûkan a Girtîgeha Qamislokê girtî man, û li gora ragihandinan li wê derê bi lêdana bi kabloyên elektrîkê û serên wan lihevxistinê îskence li wan hat kirin. Dîsa li gora ragihandinan, ferman dan wan ku heta ku ji yekê bo sisêyan dijimêrin, xwe tazî bikin, û ger nikanîbûna xwe di wê demê de tazî bikirana, li wan dixistin. Di Çileyê Pêsîn 2004an de hat ragihandin ku, hatine berdan û dozên li dijî wan, wek encameke Lêborîna Serokdewlet hatine xistin.

Li ba Amnesty International navên bêtir ji 20 zarokên din ên di navbera 14 û 17 salî de hene ku li gora ragihandinan, pistî bûyerên Adara 2004an, bêtir ji sê mehan girtî mane û awayên guhertî yên îskence û muameleya xerab li wan hatine kirin. Li gora ragihandinan muameleya xerab sopên birînan li lasê wan histine, û bûne sedema birînên wek pozên sikestî, çermikên guh ên teqîyayî û birînên bi enfeksîyon. Li gora ragihandinan wek ewên ku li jor hatin gotin, bi kabloyên elektrîkê li wan jî xistin, serên

[20] Binêrin CRC/C15/Add.212, para. 36, 52, 10 Tîrmeh 2003.

wan li hev xistin û ferman dan wan ku heta ku ji yekê bo sisêyan dijimêrin, xwe tazî bikin. Awayên din ên îskencê ku li gora ragihandinan li wan hatine bikaranîn ev bûne: dayina soka elektrîkê li dest û pêyan û endamên xesas ên las; rakirina nenûkên lingan; û bi qondaxa tivingê lêdan. Dozên li dijî wan ev bûn: "kombûna bi awayekî ku dibe ku aramîya gelêrî xera bikin "; "gotinên ku dibe ku ahenga di nav hêmanên netewe de xera bikin " û; "[pêkanîna] êrîsan bi armanca ku nehêlin rayedarên dewletê karûbarên xwe bicîh bînin "[21]. Di heman vê nivîsînê de, qet nebe du ji wan, **Tariq al-'Amrî** û **Mihemed Salih Ezîz,** li gora ragihandinan, dema ku li Dadgeha Cezayên Giran a Piçûkan a Hesekî dihatin darizandin, li Girtîgeha Hesekî girtî man.

b) Sahidnameyên mezinên ku hatine berdan

Tê bawerkirin ku pistî bûyerên Adara 2004an bêtir ji du hezar Kurdan hatine girtin. Tê ramankirin ku heta Çileyê Pêsîn 2004an ji bilî 200 kesan, hemû hatine berdan. Amnesty International gelek îddiayên îskence û muameleya xerab ji kesên berdayî sitendine. Îddia ji îskence û muameleya xerab a ku di dema girtîbûna wan a li navendên binçavkirin an lêpirsînê yên Ewlekarîya Cezayî, Ewlekarîya Siyasî an Ewlekarîya Leskerî hatine serê wan, an jî wan sahidîya wan kirine, pêk tên. Li ba Amnesty International navên gelek mexdûran hene ku xwestine ku neyên diyarkirin. Evên jêrîn di nav awayên îskence û muameleya xerab ên ku rapor kirine de ne:

- li herderê las xistin, bi çoyên bambû, cop, qarmîçe û kabloyan di nav de. Di gelek bûyeran de hestî an diranên mirovan sikandine;
- Sokên elektrîkê bo las, penîs jî di nav de;
- li ser lasên girtîyan vemirandina cixaran;
- rakirina nenûkên dest. Li gora ragihandinan, girtîyên nuh ji ber tirsa ku heman muameleya xerab wê bê serê wan jî, bi xwe nenûkên xwe gez dikirin;
- "Kursîya Alman": li kursîyeke metal ku parçeyên wê tev digerin bi qayîsan tên girêdan, pistgeh tê daxistin û pasve kisandin ku hestîyê pistê yekcar vezelîne û tazyîka mezin bide stû û çeng û lingên mexdûran;
- heqaret li wan û malbatên wan;
- gefxwarin bi daliqandinê;
- teqlîda daliqandinê: bend kirin stûyê qet nebe zilamekî;
- di serdên yekcar xerab û nesihhî de histin. Xwarin pir kêm û bêkalîte bû; çûyina sersokê bi giranî sînorkirî bû û pirê caran av û sabûn lê tunebû; girtî bi spîyên las dihatin nixumandin;
- ji bo nexwesîyan ku werem û înfeksîyonên giran ên diranan jî di nav de bûn, peyde nekirina tedawîya tibbî. Di bûyereke ji ya dawîyê de, girtîyekî bi xwe diranekî xwe bi têlekê rakir, lê belê înfeksîyonê dom kir;

[21] AI, Sûrîye: Darizandina nerewa ya girtîyên ramanê yên Kurd û îskenceya zarokan bi gistî nayê qebûlkirin, MDE 24/048/2004, 29 Hezîran 2004.

- demên pir dirêj di tecrîdê de histin, bêyî ku malbatan an parêzerekî bibîne. Xuya dibe ku di piranîya bûyeran de, li ser binçavkirina endamên malbata wan qet agahî nedane malbatan.

Sahidnameya **Hesen** (ne navê wî yê rastî ye) û sahidname yên din ên girtîyên Kurd ku îskence û muameleya xerab a di dema girtîbûnê de îddia dikin, hevdu digirin. Hesen got ku di dema girtîbûna wî de lê dane û pehîn lê xistine, û di du mehên girtî mayina li hin navendên binçavkirin û lêpirsînê de gelek awayên îskence û muameleya xerab pê kirine û wî sahidîya wan kirine. Wî got ku, di hatina navenda binçavkirinê ya yekê de,

> *… ji bo lêgerîna me hemû kincên me ji me kirin, heta derpêyên me jî, dûre bi qarmîçan li me xistin û bi xeberên pîs heqaret li me kirin, wek ji me re digotin heywan û xeber ji dê û bavê me re didan. [Demek kin pistî wê, tenê bi derpê] ji me xwestin ku em ji piyan berê xwe bidin dîwêr, 72 seetan bi destekî lingekî li hewa bihêlin ... Serê her seetê me xwe rihet dikir û em li erdê didan veketandin. Pistî du rojan ji ber êsê, û ji ber ku çengên me êdî ji ber êsê ranedibûn, me êdî nedikanî em ji piyan bisekinin, ji me dixwestin ku em destên xwe bidin pas serên xwe ... Her cara ku em bi xew ve diçûn, li me dixistin.*
>
> *Qet sersok [tunebû], tenê herêmek tije gemar û bîhneke xerab, hemû di heman odeyê de. Tucarî nedihistin em pev re bipeyivin … Sê rojan qet lêpirsîn tunebû, nedihistin em rakevin, û qet xwarin tunebû. Em dihanîn niqteya ku me êdî nedikanî em bi zelalî bipeyivîna, û dûre dest bi lêpirsînê dikirin…Yek ji me çavgirtî dibirin ber sê-çar lêpirsînvanan, û her yekî pirsek dikir ku meriv gêj bikin ku meriv bi sûcekî bê tawanbar kirin, wek mînak, 'Te kî kust? Polîsek?' Meriv bi tevlêbûna mesa Qamislokê sûcdar dikirin, an bûyerên din ku li derve diqewimîn…Ger me di dema lêpirsînê de li gora wan bersîv neda, em çavgirtî dixistin 'dolab'ê ['teker', mexdûr bi zorê dixistin nav tekerekî û dizîvirandin heta ku meriv serûbin bibe] û bi çoyên bambû an qarmîçan li me dixistin…heta ku me êdî nedikanî em li ser lingan bimînin. Dûre ji me dixwestin ku em birevin, da ku xwîna me dewr bikira û reng bida pêyên me yên ku ji lêdanan res bûbûn. Pistî demekê wan em disandin odeyê û pistî çend seetan… yekî din ji me dibirin. Ango bi hefteyan an li me dixistin an me dibîhîst ku li hevalên me dixistin.*
>
> *[Hesen got ku wî sahidîya awayên din ên îskence û muameleya xerab kiriye]. Pênc keçên Kurd anîn û heqaret li wan kirin; li qûna wan dixistin û li pês me dest bi wan dikirin…Digotin ku canê wan çi bixwaze, wê bi wan bikin. [Dûre] li pês keçan, ji girtîyekî ciwan ên 14 an 15 salî xwestin ku bi organên cinsî yên muhafizekî bilîze. [Hesen navên du biran û bavekî û kurekî yên ku zor dan wan ku bi qarmîçekî li hevdu bixin, da Amnesty International. Hesen navê zilamekî da ku hezar caran bi qarmîçe li destên wî xistine, û sût tazî ji lingan ve li hewa aliqandine û bi qarmîçan li pist û lingên wî xistine]. Pistî îskencê ew mukir hat (îtiraf kir). Ên din dibirin werîsek li qirika wan digerandin ku wan bitirsînin û bidin 'îtirafkirin' bo sûcên ku wan nekiribûn.*
>
> *[Dawîyê ji roja sesan û pey ve hinek xwarin didan wan, lê belê rojê tenê] rîçal û qetek dudu nan, birçîbûna me têr nedikir, tenê em jîndar dihistin...Her tim ji me dixwestin ku em kincên xwe derxin, bi taybetî dema ku xwarin dianîn, dûre li*

me dixistin – bi awayekî ku me êdî qet nexwesta ku xwarin bihata, ji ber ku dihat wateya dîsa lêxistinê. [di hemû dema binçavkirinê de] ji me re dihat gotin ku em ê bên îdamkirin, ji ber sûcdarîya çend sûcan, ku em 'xayîn' û 'kafir' in…ji bo rûxandina welêt xebatê dikin.

Em ewqasî ji hal de ketibûn ku me tistên ku ne lê ne, li dîwaran didîtin.

Hesen got ku li navendeke binçavkirinê ya din ku ew bi heftan lê girtî mabû,

Em kirin odeyeke girtî ku me qet tistek nedikanî bidîta…li erdê bi spî û miskan re radiketin. Porê me cilêt kiribûn. Tenê derî vedikirin ku xwarinê çeng bikin û dûre dîsa derî digirtin. Di dema xwarinê de mûslixa avê vedikirin û em teva kincan dikirin binî, û dûre dîsa li me dixistin. [Li vê navenda binçavkirinê] em tazî dikirin û davêtin ser hev. Dûre kesekî qelew dihat ser me gistan û bi qarmîçekî li serên me dixist. Bi gotinên wek 'Heywanino, nuha hun ji kîrê Seddam Huseyn hez nakin'. An 'Em li vir jiyana herî bas pêskêsî we dikin, lê hun sêkir nakin…û hun dîsa jî welatekî cîhê dixwazin.'

Hesen got ku di vê demê de tucarî destûra serdana malbata wî an parêzerekî nedane, ne jî histine ku avê li xwe bike, an egzersîzan bike, an hewa paqij bisitîne. Wî got ku demên pir dirêj nedihistin ku here tûwaletê.

c) Kurd hîn jî tên binçavkirin û bi darizandinên nerewa re rûbirû dibin

Ji li dor 200 Kurdên ku tê bawerkirin ji bûyerên Adara 2004an û vir ve girtî mane, 15 di 24 Hezîran 2004an de ji bo DBEDê hatin sewkkirin. Ev in: **'Emer 'Umer, Kahdar Xalid, Mesûd Xalid, Hesen 'Umar, Mûrad Aslan, Daglas Xelîl, Senîdan Mihemed Yusuf, Siyar Mihemed Yusuf, Zedesta Muhemed Yusuf, Zibar Mihemed Yusuf, Tewfiq Huseyn, Manal 'Abdî, Diyar 'Alî, Ciwan Xalid,** û **Cîvara Sukrî**. Doza: "hewldana veqetandina parçeyek axa Sûrîyê û tevlêkirina wê bo dewletek biyanî" li wan vebû (Xal 267 a Qanûna Cezayê); "tevlêbûna hucreyên ku dixwazin siûra neteweyî qels bikin û pevketina nav civakan tev bidin" (Xal 285 a Qanûna Cezayê); "tevlêbûna rêxistineke neqanûnî" (Xal 288 a Qanûna Cezayê); û "êrîskarîya bi armanca gijkirina serê navxweyî û serê nav civakan û teswîkkirina kustinê" (Xal 298 a Qanûna Cezayê). Ceza herî giran a Xal 298, ceza mirinê ye[22].

Di 3 Çileyê Pêsîn 2004an de, van 15 girtîyên Kurd dest bi greweke birçîbûnê kir ku rewsên binçavkirina xwe ya li 'Girtîgeha Adra' protesto bikin. Gotin ku li girtîgehê muameleya xerab bi wan tê kirin ku xwarina kêm-kalîte û têrnekir, lêdan û heqaret, û sînorkirinên serdanan û kirina egzersîzan di nav de bûn. Serdan bi malbata nêzîk sînorkirî ne û tenê dikanin ji du mehan carekê bên kirin, ger û dema ku berê destûr ji Besa Ewlekarîya Siyasî bê sitendin. Serdan 30 deqîqan dajon û destûra bi Kurdî peyivînê tune. Li gora ragihandinan, pistî rawestandina grewa xwe ya birçîbûnê di 16 Çileyê Pêsîn 2004an de, dema ku rayedarên girtîgehê gotin ku wê serdên wan ên binçavkirinê çêtir bikin û lêdanan bisekinînin, li girtîyan xistin û ew qarmîçe kirin.

Piranîya li dor 190 Kurdên din ên ku hîn jî girtî ne hatin transferkirin bo herêma bin hukimê Dadgêrê Leskerî ku li gora ragihandinan, biryar daye ku heyeteke taybetî pêk

[22] Di 2002 û 2003an de, qet nebe 27 mirov li Sûrîyê hatin îdamkirin.

bîne ku li dozên wan binêre. Di dema nivîsînê de, pêkhatin, fonksîyon û prosedurên vê heyetê nehatibûn diyarkirin û darizandinan dest pê nekiribûn.

6. TEMÎ

Li ser girtîyên ramanê, azadîya ramanê û pêsdebirina mafên mirovan:

- Girtîyên ramanê Mihemed Mistefa, Serîf Remezan, Xalid Ehmed Alî û Mesûd Hemîd, li gel hemû girtîyên din ên ramanê li Sûrîyê berdin;

- Bila qanûnên ku li gora wan girtîyên ramanê tên girtin li gora Xal 18 – 22 ên Peymana Navneteweyî ya Mafên Sivîl û Siyasî (ICCPR) bên guherandin, ku Sûrîye ji 1969an û vir ve alîyekî wê ye, û mafê azadîya ramanê, îfadekirin, civîn û rêxistinê û mafê bikaranîna van azadîyan bêyî têkilbûnê garantî dike;

- Biryarên avêtina bi dehan xwendekarên Kurd ji zanîngehê ji bo ku nêrînên xwe asitîyane anîne zimên, betal bikin;

- Rêzdarî bigirin bo Deklarasyona NY a Maf û Berpirsiyarîyên Kes, Kom û Organên Civakê ku Mafên Mirovan ên wek Gerdûnî hatine Naskirin û Azadîyên Bingehîn Pêsde Bibin û Biparêzin, ku ji alîyê Komcivîna Gistî ya NY di 9 Çileyê Pêsîn 1998an de hatiye pejirandin, ku di Xal 1 de dibêje ku "mafê herkesî heye ku wek kes an bi kesên din re mafên mirovan û azadîyên bingehî di mustewayên neteweyî û navneteweyî de pêsde bibin û hewl bidin ku biparêzin" û tedbîrên di Deklarasyona pêsdebirin û parastina mafên mirovan û azadîyên bingehî bicîh bînin.

Li ser kustinên neqanûnî ên gumanbar û mirinên ji ber îskence û muameleya xerab a dema binçavkirinê:

- Ji bo îddiayên jêrîn ên kustinên neqanûnî li gel mirinên ji ber îskence û muameleya xerab di dema binçavkirinê de, lêpirsînên serbixwe û alînegir pêk bînin; her kesekî ku gumana kustina neqanûnî lê tê kirin dozê lê vekin, û tezmînatê bidin malbatên qurbanîyên jêrîn:

a) qet nebe 36 kesên ku di dema bûyerên Adara 2004an de hatin kustin;

b) Kurdên ku li gora îddiayan wek encama îskence û muameleya xerab di dema binçavkirinê de mirine;

c) eskerên Kurd ku di rewsên gumanbar de, li gora ku tê îddiakirin ji ber nasnameya wan a Kurdî mirine.

Li ser bûyerên Adara 2004an û cûdagirtina li dijî Kurdên li Sûrîyê:

- Ji bo bûyerên Adara 2004an lêpirsînekê pêk bînin ku:

a) çawa dibe ku esebîyeta di maçeke fûtbolê de dibe sedema serhildanên berfireh;

b) lêpirsîna bi qasî ku xuya dibe, bersîva bêmêzîn a hêzên ewlekarîyê bikin;

c) lêkolîna cûdagirtina sîstematîk û binpêkirinên din ên mafên mirovan ku dibe ku bûbin sedema esebîyet û peqîna tundkarîyê bikin;

d) çareserîyên bo van binpêkirinan pêsniyar bikin ku ji bo pêsîlêgirtina bûyerên wek wan di dahatûyê de bibin alîkar.

- Qanûnên hemwelatîyê biguherînin ku çareserîyeke bilez bo bêdewletbûna Kurdên ku li Sûrîyê hatine dinyê bibînin, wek ku Komîteya Rakirina Cûdagirtina Nijadî (CERD) di 1999an[23] de û Komîteya Mafên Zarokan (CRC) di 2003an[24] de temî kirine, û hemû cûdagirtinên li dijî Kurdên bêdewlet li gel warên perwerdê, lênêrîna tendurustî, azadîya tevgerê, xebat, û xwedîtîya milkan, bidawî bînin;

- Qedexeyên li ser bikaranîna zimanê Kurdî li perwerdê, kargehê, sazîyên fermî û pîrozbahîyên fermî bidawî bînin, û bihêlin ku zarok bi navên Kurdî qeyd bibin û karsazî navên Kurdî li xwe bikin;

Li ser lixwegirtinên Sûrîyê ên li gora Peymana NY a li Dijî Îskencê (CAT) û hevkarîya wê ya bi mekanîzmayên tematîk ên YN re:

- Qanûn û pratîkan li gora Konvensîyona NY ya li Dijî Îskenceyê (CAT) pêsçav bikin, ku Sûrîyê di Tebaxa 2004an de pejirandiye, û bila hemû provîzyonên wê bi gistî bên bicîhanîn. Amnesty International tevlêbûna Sûrîyê xwes dibîne û rayedarên Sûrîyê teswîk dike ku:

- fermî û vekirî li dijî îskencê derkevin;
- biryarnameya hiqûqî ya hejmar16 a Biryarnameya Qanûna Bingehî hejmar 14 a 1969an ku dibêje ku wê ji bo sûcên ku dema kirina karê xwe dikin, doz li karmendên birêvebirîya Ewlekarîya Dewletê venebe, betal bikin. Divê her weha rayedarên dewletê hemû qanûnên din ên ku karmendên hêzên din ên ewlekarîyê ji dozlêvekirina bo sûcên ku di dema kirina karê xwe de dikin muaf in, betal bikin;
- bincavkirina tecrîdî bikin neqanûnî, wek ku Raportorê Taybetî yê NY bo Îskencê bang kiriye[25];
- hemû binçavkirinên nehênî bidawî bînin;
- ji bo dema lêpirsîn û binçavkirinê parastinan bicîh bînin, ku belêkirina serdanên rêzdar ji alîyê sazîyeke serbixwe bo cîhên binçavkirinê di nav de be;
- sazîyeke serbixwe pêk bînin ku bilez û bêalî lêpirsîna hemû gilî û raporên îskence û muameleya xerab bike;
- li dadgehan û hemû pêvajoyên hiqûqî yên din, ji bilî yên li dijî kesekî ku bi îskencê hatiye sûcdarkirin, bikaranîna hemû îfade û delîlên din ên ku di bin îskincê de hatine sitendin, qedexe bikin;

[23] binêrin CERD/C/304/Add.70, paragraf 14
[24] binêrin CRC/C/15/Add.212, paragraf 33 (b)
[25] Raportorê Taybetî yê îskencê got ku "Îskence herî pir di dema binçavkirina di tecrîdê de tê bikaranîn. Divê binçavkirina di tecrîdê de bikin neqanûnî, û kesên di tecrîdê de divê bê derengî bên berdan." E/CN.4/2003/68, para. 26.

- herkesê ku gumanbarê kirinên îskence an muameleya xerab e, bînin ber dadê;
- prosedurên perwerdê bo hemû karmendên bi binçavkirin, lêpirsîn an muameleya girtîyan têkildar pêk bînin ku zelal bikin ku îskence û muameleya xerab sûc in û mecbûr in ku tu fermanên îskencekirinê bicîh nehînin;
- bikin ku mafê qurbanîyên îskencê û malbatên wan ê sitendina tezmînatê û ê qurbanîyan bo dayina lênêrîna tibbî û rehabîlîtasyonê hebe;
- Protokola Bijartekî ya Konvensîyona li dijî Îskencê îmze bikin.

- Dawetnameyan bisînin bo Koma Xebatê ya NY bo Girtina Keyfî, Raportorê Taybetî yê NY bo Îskencê, û Nûnerê Taybetî yê Sekreterê Gistî yê NY bo Parêzvanên Mafên Mirovan ku werin serdana Sûrîyê.

Li ser reforma sîstema dadê:

- **acilen pêsçavkirina Qanûna Rewsa Awarte (QRA)** ku ne li gora pêwîstîyên qanûna mafên mirovan e, bi taybetî Xal 4 a Peymana Navneteweyî ya Mafên Sivîl û Siyasî (ICCPR) ku Sûrîye alîyekî wê ye [26];

- **bicîhanîna reformên sîstema dadê, bi taybetî da ku bicîh bike ku hemû prosedurên dadgehan li gora standardên navneteweyî yên bo darizandina rewa bin.**

Ev vergera fermî ya Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî (Amnesty International) nine.
Qopyekî belga esil ya:Salek pistî bûyerên Adara 2004an Kurd li Komara Ereb a Surîyê ya bi hêjmara (index:MDE24/002/2005) kane bê dîtin li ://www.amnesty.org

[26] Komîteya Mafên Mirovan ku çavdêrîya bicîhkirina dewletan a ICCPR dike, di lênêrîna rapora dewra dudan a Sûrîyê di Nîsana 2001ê de, fikarên xwe li ser QRA li Sûrîyê anîn zimên, got ku "li dijî tedbîrên ku maf û azadîyên bingehî yên hemwelatîyan bisînor dike, çareserîyan pêskês nake". Komîteyê temî kir ku QRA "heta ku dibe zû bi fermî bê rakirin ".